




Rêbernameyek ji bo xebata li Brîtanayê


Mafê xebatê li Brîtanayê

Heta ku hûn ne hemwelatîyek Brîtanî bin, divê hûn îspat bikin ku mafê we heye ku hûn li Brîtanaya bixebitin. Kardêr dikarin bèn ceza kirin, an jî bi hepsê re rû bi rû bimînin heke ew kesek neqanûnî bixebitênin.

Zêdetirî 20 celeb vîzayên xebatê yê taybetî li Brîtanayê hene û lîste bi rêkûpêk tê nûve kirin. [Vî karûbarê serhêl](#) bikar bînin da ku hûn bizanin ka vîzeya we ya rast heye ku hûn li Brîtanayê bixebitin.

Ji bo agahdariya kûrtir li ser wêneyan an girêdanan bitikînin

<p>Îspatkirina mafê xebatê</p> 	<p>Ger ji we re hat gotin ku hûn dikarin rewşa xwe ya koçberiyê li serhêl bibînin, hûn dikarin koda parvekirinê bistînin da ku mafê xwe yê xebatê li Brîtanayê îspat bikin. Kod 30 rojan derbasdar e û dikare bi kardêran re were parve kirin, ku paşê ew dikarin kontrol bikin:</p> <ul style="list-style-type: none">• Cureyê kar ku destûr heye hûn bikin• Hûn dikarin çiqasî li Brîtanayê bixebitin• Ger hûn doza feydeyan dîkin an digihîjin karûbarên NHSê• Ger hûn dikarin hesabek bankê vekin <p>Hûn dikarin bi riya malpera hikûmetê xwe bigihînin koda parvekirina xwe. Dê pêwîstî ya we bi pasaport an qerta nasnameya we, Destûra Niştecihiya Biyometrîk (BRP) an vîze û jimareya Karta Niştecihbûna Biyometrîk hebe.</p>
<p>Hejmara Sîgorteya Neteweyî çî ye?</p> 	<p>NINO ji bo Hejmara Sîgorteya Neteweyî ye û ji bo dayîna bacê, sigorteya neteweyî û her weha daxwazkirina tezmînatê hejmarek referans e.</p> <p>Hemwelatîyên Brîtanî di 16 saliya xwe de NINO distînin. Ji penaberan re jî NINO tê derxistin. Lêbelê, ev ji bo her kesê ku mafê xebatê ye derbas nabe, ji ber vê yekê dibe ku hewce bike hûn ji bo yekê serlêbidin.</p> <p>Hûn dikarin bêyî NINO dest bi xebatê bikin, lê hûn dê hewceyê yekê bin da ku hûn pê ewle bin ku tevkarîyên sîgorteya neteweyî û baca ku hûn didin rast li ser navê we hatine tomar kirin. Ev dikare heya 16 hefteyan bidome ji ber vê yekê hêja ye ku hûn di demek herî zû de vê yekê bikin.</p>
<p>Lîsteya karên ku kêmasiya wan heye</p> 	<p>Lîsteya karên ku kêmasiya wan heye listeyek karan e ku karsaz û kardêrên Brîtanayê bi kêmbûna karkeran re rû bi rû ne.</p> <p>Kesên ku li penaberiyê digerin bi gelemperî nayên destûr kirin ku bixebitin lê heke daxwaza wan piştî 12 mehan bêyî xete ya wan bixwe berbiçav be, û ew bi guncawî jêhatî bin, ew mafdar in ku serlêdana karên li ser listeya karên hewce bikin.</p> <p>Ji bo mafê xebatê di van karan de divê hûn bi nivîskî serî li Vîzeyên Brîtanaya</p>

	<p>û Koçberiyê bidin.</p>
<p>Karûbarên Aşkerekirin û Astengkirinê</p> 	<p>Gelek karên li Brîtanyayê kontrolkirina paşbingeha qeyda sûcî hewce dikin. Ev bi gelemperî karên bi zarok, kal û pîr û kesên astengdar re di hewênin.</p> <p>Karûbarên Aşkerekirin û Astengkirinê (DBS) ji bo kardêran rêyek e ku qeyda sûcê we kontrol bikin. Kontrol tenê di hundurê Brîtanya de dikare were kirin. Ger ev 5 sal in hûn li Brîtanyayê nejiyabin, dibe ku hûn hewce bin ji welatê xwe serlêdana 'Belgeya Karaktera Baş' bikin. Pêvajoya serlêdanê welat bi welat cûda dibe.</p> <p>Dibe ku ji we re zahmet be ku hûn van tomaran ji welatê xwe bistînin, ji ber vê yekê hêja ye ku hûn bi kardêran re li ser kontrolên alternatîf ên wekî zêdetir referansên kesayetî biaxivin. Her weha hûn dikarin bi navgîniya pisporek dadrêsî pêşniyar bikin ku 'sond xwarin' bikin.</p> <p>Hin mehkûmîyetên sûcî wek 'serfkirî' têne hesabandin û ne hewce ne ku bêne ragihandin. Lêbelê, qaîde tevlihev in, ji ber vê yekê heke hûn mehkûmek sûcdar bin û ji hêla kardêrek ve ji we were pirsîn baştîre ku hûn li pêşniyaran bigerin.</p>

Xalên Sereke

1. Xebata li Brîtanyayê bêyî belgeyên rast neqanûnî ye
2. Kardêr gerek kodek parvekirinê bixwazin da ku mafê weya xebatê kontrol bikin
3. Hewceye ku hûn serlêdana Hejmara Sîgorteya Neteweyî bikin da ku hûn bixebitin an doza berjewendiyan bikin
4. Ji bo gelek karên li Brîtanyayê kontrolek qeyda sûcî e bi navê DBS pêwîste

Girêdan û çavkaniyên kêrhatî

- [Citizen's Advice](#) li ser belgeyên cihêreng ên ku hûn dikarin li gorî rewşa xweya koçberiyê hilberînin, gelek agahdarî û şîretên zela û hêsan fêhm bibin hene.
- Listeyek nûvekirî yê **Brîtanya** li ser [vîzeyên kar](#)
- Primên [Sîgorteya Neteweyî](#) çi ne?
- Projeya Migration Justice [rêbername](#) amade kiriye da ku alîkariya kesên ku li penaberiyê digerin fam bikin ka ew çawa an jî dikarin ji bo destûra xebatê serlêdan bikin dema ku doza wan didome.
- [Welatên ji A-Z](#) û pêvajoya serlêdanê ji bo kontrolên qeyda sûcên derveyî welat
- Rêbernameya hukûmetê li ser [sond xwarinê](#) û referansa kesayetî ji bo kesên ku serlêdana destûrnameya SIAYê ku ji bo xebitandna di karûbarên ewlehiyê de hewceye.
- Ger qeydek we ya sûc hebe, [Unlock](#) dikare agahdarî, şîret û piştgirî bide.

Rêbernameyek ji bo xebata li Brîtanyayê

Cureyên kar

Kar bi gelemperî dikeve nav yek ji sê kategoriyan:

Sektora taybet - ev şîrket û karsazî ne ku ji xwediyên xwe re fêyde tênin. Ew bi firotina mal û karûbaran têne fînanse kirin. Wek mînak dikan, otêl, embar û kargeh hene.

Sektora giştî - ev rêxistinên ku ji hêla hikûmetê ve têne rêvebirin in. Ew ji bo berjewendiya civakê xizmetê didin û pereyê wan ji hêla bacan ve tê dayîn. Di nav wan de dibistan, nexweşxane û meclîsên herêmî jî hene.

Sektora dilxwaz - ev wekî 'Sektora sêyemîn' jî tê zanîn û xêrxwaz, komên civakê, pargîdaniyên civakî, û komên din ên ku feydê nagirin di nav xwe de dihewîne.

Ji bo agahdariya kûrtir li ser wêneyê an lînkê bitikînin

Rewşa we ya kar çawa ye?



Mafên we yê karkirinê bi [rewşa kar](#) ve girêdayî ye.

Ger kardêrê we karê birêkûpêk peyda dike, dibêje kengê û li ku divê were kirin, hûn **karmend** in. **Karkerek** bi demjimêrên birêkûpêk an garantîkirî ji hêla kardêrê xwe ve nayê pêşkêş kirin, wek nimûne karmendên rojane an karkerên demsalî.

Di her du rewşan de, kardêr li ser navê we bac û sîgorteya neteweyî dide û mafê we heye ku hûn mafên bingehîn ên karkirinê, wek betlaneya salane ya bi mûçe û mûçeya kêmtirîn bistînin. Heger tu nîv-wext dixebitî, mafên te yê wekî xebatkarek tam-wext heye.

Agahiyên bêtir dikarin bêna ditînin li ser [Beş E – Mafên we yî li kar](#)

Ajansên kargêriyê û kar



Ajansa kargêriyê li ser navê kardêran dixebitin ku berendamên guncan bibînin da ku cîhên xwe yî kar ên vala dagirin. Ajansêk kargêriyê divê ji bo bidestxistina karekî ji we **tu carî** xercek nestîne.



Hin ajansên kargêriyê, karmendan ji bo karsaziyên din peyda dikin lê ew bi xwe pere didin karmendan. Ew wekî karsaziyên kar têne zanîn. Di vê rewşê de hûn dibin [karkerê ajansê](#). Ev pir caran di sektorên wekî çêkirin û embarkirinê de ye.

Peymanên kar



Dema ku karek ji we re tê pêşniyar kirin, kardêrê we **divê** 'daxuyaniyek nivîskî ya hûrguliyên kar' pêşkêşî we bike, ku pir caran wekî [peymanê kar](#) tê binav kirin. Ev peymanek qanûnî ye ku maf û berpirsiyariyên we destnîşan dike. Karkerên ajansê jî divê ji roja ewil ve bi nivîskî hûrguliyên kar bistînin û xwedî mafên bingehîn ên karkirinê bin.

Di peymanên daîmî de ji bo kar tarîxek dawîn a diyarkirî nîne. Di peymanên demkî, an derbasdar de ji bo kar tarîxek dawîya diyarkirî heye. [‘Peymana bi sifir-saet’](#) tê wateya peymanek ku tê de demjimêrên xebatê

	yên herî kêmtir e.
	<p>Şagirtî celebek karûbarê bi mûçe ye ku karmend hin wextê xwe perwerdehiyê derbas dike, ku dibe sedema jêhatîbûnek naskirî ya neteweyî.</p> <p>Gelek kes difikirin ku şagirtî tenê ji bo ciwanan e, lê mirovên ji her temenî dikarin serlêdana şagirtiyê bikin, mîna her karê din. Lêbelê, mûçeya herî kêmtir ji bo şagirtî jî karên din pir kêmtir e.</p> <p>Perwerdehiya şagirtiyê ji hêla hukûmetê ve tê fînanse kirin ji ber vê yekê dibe ku hin komên koçber nîkaribin bigihîjin vî celebî.</p> <p>Hûn dikarin derheqê şagirtiyê de bêhtir hîn bibin û li fersendên nêzî xwe bigerin li ser malpera hukûmetê.</p>
	<p>Kesên xwe bikar xwediyê şirket an karsaziya xwe ne û ji xwe berpirsiyarin bê ew çawa û kengê dixebitin. Ew bi xwe bac û Sîgorteya Neteweyî didin. Ew wek karmend û karkeran ne xwediyê heman maf û berpirsiyariyên karkirinê in. Heke hûn xwe bikarin û salê zêdetirî 1000 £ qezenc dikin, divê hûn ji bo armancên bacê li Ofisa Berhevkirina Bacê ya Britanyayê (HMRC) qeyd bikin.</p> <p>Dibe ku hûn karkerek/karmendek şirketekê bin lê di heman demê de karsaziya xwe jî bi rê ve bibin û di heman demê de xwe bikar bin.</p>

Xalên sereke

1. Hemî kardêr, tevî ajans, xwedî berpirsiyariyek qanûnî ne ku li ser şert û mercên we yên kar daxuyaniyek nivîskî bidin we.
2. Ger hûn karker an karmend bin, mafê we yê bingeînê ê karkirinê heye. Heger hûn jî bo ajansêkê bixebitin an jî xwedî peymanek niv-wext, rojane, an bi sifir-saet bin jî derbasdare.

Girêdan û çavkaniyên kêrhatî

- Hikûmet [statîstîkên mehane](#) diweşîne ku tê de agahî li ser hejmara kesên di karde û cihên vala de hene.
- Ev [rêbername](#) li ser cûdahiyên di navbera sektora giştî û taybet a li Brîtanayê de û avantajên/dezavantajên xebatê di her sektorê de nêrîneke giştî dide
- Enstîtuya Karmend û Pêşkeftinê ya Destûrkirî xwedî pirtir [agahdarî](#) li ser tiştên ku divê di peymanê kar de be.
- Agahdariya li ser qaîdeyên ku [ajansên kar](#) dihewînin
- Ev [rêbernameyek xwe bikarkirinê](#) alîkare, ji hêla Koma Reforma Baca Dahatên Kêmtir (Low Income Tax Reform Group) ve, ku di heman demê de agahdarî dihewîne ku ji we re bibe alîkar ku hûn [dixebitin an xwe bikarbin](#)

Rêbernameyek ji bo xebata li Brîtanyayê



Dîtin û serîlêdana karekî





Piraniya valahiyên kar li serhêl têne reklam kirin. Ev tê vê wateyê ku hewceye hûn zanibin ka meriv çawa komputerê bikar tîne. Lêbelê, hîn jî hêja ye ku meriv li deriyê kardêrên herêmî bixin da ku bipirsin ka karên wan ên vala hene yan na.


Gelek pêşniyar û agahdarî li ser çawaniya serlêdana kar hene. Ev beş amûrên bingehîn dihewîne.

Hûn ê di dawiya vê beşê de lîsteyek malperên bi pêşniyarên hêja ji bo nivîsandina CV û nameyên ravekirinê bibînin.

Ji bo agahdariya kûrtir li ser wêneyê an lînkê bitikînin

<p>Malperên lêgerîna kar</p> 	<p>Bi sedan malperên kar ên cihêreng, an jî malperên kar hene, ku hûn dikarin valahiya kar ên ku hatine reklam kirin bibînin. Hûn dikarin lîsteyek yê ku herî zêde têne bikar anîn li vir bi çend pêşniyaran re bibînin ka meriv çawa ji bo we ya herî baş hilbijêre. Ajansên kargêriyê bi gelemperî malperên kar bikar tînin.</p> <p>Hin malper hene ku di hin pîşeyan an sektorên xebatê de pispor in. CharityJob mînak e ku ji hêla Sektora Sêyemîn ve bi berfirehî tê bikar anîn.</p> <p>Gelek şîrket li ser malpera wan rûpelên ku cihên vala yê kar lîste dikin hene, û hûn dikarin rasterast li ser malpera wan serlêdan bikin. Ev bi karsaziyên mezin re gelemperî ye, ji ber vê yekê heke hûn şîrketên sereke yê ku di pîşesaziya we de dixebitin dizanin divê hûn ji bo nûvekirinên malperên wan qeyd bibin.</p>
<p>Têkilî avakirin</p> 	<p>Têkilî avakirin girîng e û gelek kes di ser heval, malbat û hevalên berê re kar peyda dikin. Heke ew torên li Brîtanyayê nebin ev pir diwartire, lê belê ev heye riyên avakirina wan.</p> <p>Hêja ye ku hûn CV û nameya ravekirinê ji karsaziyên piçûk û navîn re bişînin da ku li valahiyan bipirsin. Ev şîrket bi piranî ne xwedî personelên Çavkanîyên Mirovîyê, ji ber vê yekê cihên vala her gav nayên ilam kirin. Her çend di vê gavê de tiştek wan tune be jî, ew rêyek e ku meriv dest bi axaftinê bike û heke di pêşerojê de tiştek derkeve ew ê we bi bîr bînin.</p> <p>LinkedIn ji bo pisporên ku kar dibînin malpera tora serhêl ya herî naskirî ye. Li vir çend pêşniyarên baş hene ku meriv wê çawa ji bo berjewendiyê xwe bikar bîne gava ku li kar digerin.</p>
<p>Jêhatîbûnên veguhezbar</p>	<p>Jêhatîbûnên veguhezbar jêhatîbûn in ku hûn di her karî de bikar tînin. Hin hêsan in ku di serlêdanek kar de bêne ravekirin, mînak rêveberiya projeyê û jêhatîbûna ITyê. Jêhatîbûnên din ên veguhezbar avakirina pêwendiyê û baldariya hûrguliyê ne.</p> <p>Jêhatîbûnên veguhezbar li Brîtanyayê pir girîng têne hesabandin. Kardêr</p>

	<p>dizandin ku kesek xwedî jêhatîbûnên veguhêzbar vekirîye ku xwe li hev werêne li gorî cîhên karî ku duguhere. Gelek raveyên kar rêzek jêhatîbûna ku şirket lê digere lîste dikin. Dibe ku hûn ne xwediyê hemî jêhatîbûnên daxwazkirî bin, lê jêhatîbûnên weyên veguhezbar dikarin pir wek wan bin.</p>
<p>CV û nameyên ravekirinê</p> 	<p>CV, belgeyek e ku perwerdehiya we, jêhatîbûn, ezmûn û dîroka karûbarê we liste dike. Ji bo nivîsandina CV rêyek rast an xelet tune lê çend rêzîkên bingehîn hene ku divê hûn bişopînin.</p> <ul style="list-style-type: none"> • Avayek zelal bikar bînin • Kurt bigirin • Xeletîya nekin • Wê li gorî rolê sererast bikin <p>Tiştê ku divê di CVya we de tinebe</p> <ul style="list-style-type: none"> • Navnîşana e-nameya neprofesyonel • Wêne • Agahiyên kesane
<p>Formên serîlêdanê</p> 	<p>Kardêr her gav CVyekê naxwazin. Carinan ew ê ji we bixwazin ku hûn forma serîlêdanê tije bikin, ku bi gelemperî serhêl e. CVya we dê li vir bikêrhatî be ji ber ku hûn dikarin piraniya agahdariyê kopî û paste bikin.</p> <p>Dema ku hûn serîlêdana kar tamam dikin, her gav beşek heye ku ji we dipirse ku hûn di derheqê serlêdana xwe de bêtir rave bikin. Ev ji nameyek ravekirinê bêtir hûrgulî hewce dike.</p> <p>Karûbarên vala bi gelemperî bi Danasînek Kar û Taybetmendiya Kesî têne reklam kirin, ku ji we re vedibêje ka kar çî tê de ye, û lîsteyek jêhatîbûn, zanîn û ezmûnê hewce dike ku vî karî bikin.</p> <p>Dema ku hûn vê beşê tamam bikin, divê hûn hewl bidin ku bersiva xwe bi vê lîsteyê re hevber bikin, heke mimkun be mînakan bidin.</p> <p>Bi gelemperî ji bo serîlêdana karekî muhletek heye. Heta deqeya dawî nehêlin!</p>
<p>Hevpeyvîn</p> 	<p>Hevpeyvîna kar dibe ku rû bi rû, bi tîlefona an bi nermalava konfêransa vîdyoyê pêk werin.</p> <p>Pêdivî ye ku hûn ji berê de ji bo hevpeyvîn û lêkolînê bi qasî ku mimkun be di derbarê şirket û rola kar de amade bibin.</p> <p>Hin pirsên gelemperî hene ku kardêr dibe ku bipirsin ji ber vê ku hûn dikarin bersivên xwe ji van re pratîk bikin. Nimûne ev in:</p> <ul style="list-style-type: none"> • Tu dikarî ji me re behsa xwe bikî? • Çima tu dixwazî li vir bixebitî? • Hêz û qelsiyên te çî ne? • Tu karê xwe çawa birêve dibî? • Tu dikarî ji min re mînakek bidî ku gava tu neçar bûyî ku bi rewşek dijwar re mijûl bibî? <p>Di dawiya hevpeyvînê de dibe ku ji we were pirsîn ka pirsên we hebin.</p>

	Piştrast bin ku pirsên we têkildar in. Tu dikari li ser derfetên perwerdehiyê an çanda xebata rojane bipirse.
<p>Referans</p> 	<p>Referans ew mirov in ku dikarin li ser ezmûna xebata we, jêhatîbûn û karaktera we biaxivin. Pir kardêr du referansan dipirsin, yek ji wan divê rêveberê weyî herî dawî be. Dibe ku rêveberek bikaribe li ser jêhatîbûnên we yê veguhezbar biaxive, mînakî ku hûn organîze ne û çareserkerek başin.</p> <p>Dibe ku peydakirina vê agahiyê ji bo hin kesên nû li Brîtanyayê dijwar be, heke referansên xebata we hemî ji derveyî welat bin, dibe ku hûn yekî ku rehet e ku bi Îngilîzî biaxive tevî bikin.</p> <p>Referansên kesayetiyê dikarin ji her kesê ku dikare li ser taybetmendiyên weyên kesane yê baş biaxive be, Karê dilxwazî rêyek baş e ji bo bidestxistina referansên ku dikarin ji dilpakî, pêbawerî û xwezaya baş piştrast bikin.</p>

Xalên Sereke

- Lêgerîna karê xwe rasterast ji malperên herî maqûl re bişînin**
- Divê CVya we kurt be û piştrast bin ku xeletiyên rastnivîsînê tune ne**
- Jêhatîbûnên veguhezbar li Brîtanyayê girîng têne hesabandin. Li ser hêz û qelsiyên xwe yê kesane bifikirin.**

Girêdan û çavkaniyên kêrhatî

Bi sedan rêber hene ku meriv çawa serlêdana kar li Brîtanyayê dike. Li vir çend nimûneyên baştir hene

- [Amûrên Vegera Kar](#)
- [Amûrên Serlêdana Kar](#)
- Çawa [nameya ravekirinê](#) binivîsin
- Hin [mînakên](#) nameya ravekirinê
- Hin ji [fêydeyên jêhatîbûnên veguhêzbar](#)
- [20 Serîşteyên Ji bo Hevpeyvînên Gewre](#)
- [Tora Karê Penaberan \(The Refugee Employment Network\)](#) tora endametiya neteweyî ye ku li ser afirandina derfetên karên baştir ji bo penaberan li seranserê Brîtanyayê ye. Li ser malperê bi rêkûpêk derfetên kar ên nûvekirî hene.